



Daxuyan

Efrîn: Kuştina "Elî Ehmed" ê temenmezin, bi lêdanê



Piştî ku, Artêşa Turkiyê, li 18.3.2018an Herêma Efrînê ya kurdî - Bakur Rojavayê Sûriyê dagîr kir, destên milîsên sûrî yên terorîst ên bi wê û Itîlafê Elsûrî - Elixwanî ve girêdayî filitandin, da ku, herêmê talan bikin û binpêkirin û tewanên dixwazin pêk wînin, bêyî ku, baldariyê bidin gotinên "rewaker û şêxên şoreşê" (Pêgiriya bi sinc û perensîpên Ola Islamê di şer de, mîna qedexebûna xwînretina hemwelatîyan û destdanîna ser mal û milkên wan, û destavêtina namûsê...H.W.D); Yan ji gotina Pêxember Mihemed (Xwîn, mal û namûsa her Misilmanekî li yê din heram e) ibretê werbigirin; Û yan jî rêzgirtina zagona navdewletî ya mirovahî bikin; Ta asta ku, sivîlên li herêmê hatine nişteçîkirin jî, dest bi binpêkirin û tewanan kirin, ji bilî destdirêjîyên rojane ku, di dermafê xelkê Efrînê de dikin. Û siyasetên dijminayetî yên rêkûpêkirî yên Hikometa "Eledalê we Eltenmiyê" bi serokatiya "Receb Teyib Erdoxan", û ew gotarên kîn û hurhitandinê (yên ku, di bi navên cudaxwazî, kafirî, gawirî û tinaziya bi ola Islamê têne belavkirin de), li piş pêkirina wan kiryarên hovane ne.

Li 22.4.2020an, li piştî nîvro, nişteçîkerê bi "Fehid Elmerhî" tê navdan, ê ji êla " Benî Xalid" û ji xelkê gundewarê Humsê, bi awakî hovane li hemwelatîyê temenmezin "Mihemed Ehmed Elî" yê /74/salî û bi "Elîkê" tê navdan, ji Bajarokê Meydankê - Efrîn dixê, ta ku, dike. Ji ber ku, ew li pêşiya kujer sekiniya û nehîşt pêz li nav zeviyê zeytûnan - ê ku, li Başûrê mala wî dikeve - biçêrîne. Hêjaye em xuya bikin, ku hewildanên hevîna rehmetî û jineke din, nikanîn kujer biseknandana, û ew jî tûşî derzandinê bûn. Herweha, kujer û malbata xwe ve di guvêşgeha zeytûna ya (Mihemed Ne'isan) de - ya li nêzik zeviyê û di bin destlatiya "Lîwa'i Elsultan Elmûrad"de - rûdiniştin.

Tewanên kuştinê yên mebestkirî û li dijî sivîlan - bi taybetî jî yên navsal û temenmezin - li Efrînê, di bin çavdêrî û serpereştiya destlat û istîxbaratên dagîrkeriya Turkiyê de, berdewam in. Tewana kuştina "Fatme Kinê" ya temenmezin a berî çend rojan, li Gundê Hêkiçê - Navça Şiyê, û yê ji bilî wê bidehan nimûne ne.

Li siba Pêncşemê 23.4.2020an, li goristana Meydankê, terma "Elîkê" yê bêşûc, bi beşdariya cemawereke ji hezkirî û xelkên bajaran û gundên derdorê - bi hestên tijî pirotestkirin û şermezarkirin - hate binaxkirin û oxirkirin. Û ji ber ku ew tewana li ba Kurdan bi giştî û herkesê ku, bi perensîpên mirovahiyê û welatparêziyê serbilind, çiyê şermezariyê ye; Ji Hemahengiya Sûrî "Itîlaf Elsûrî" ya rikber û pêkhatyên wê, û her Sûriyekî welatparêz tê xwestin ku, vê tewana hovane û yê weke wê şermezar bikin, da ku, fitna di navêna Kurd, Ereban û pêkhatyên din de - ya ji aliyên ku, dijayetiya Dewleta Sûriyê û gelê wê dikin ve, tê pêlankirin - , di cî de were dorpêçkirin û fetsandin.

Berpirsiyariya siyasî û zagonî ya Turkiyê -weke dewleteke dagîrker ji Herêma Efrînê re - , li ser destlatên wê erka lêkolîneke aşkere û vekirî, ji vê tewanê û yê din re, û herweha cezakirina tewankaran ferz dike.

Di dema ku, Kurd û welatparêzên Sûriyê, bê navber hewil didin, ku hebûna dagîrkeriya Turkiyê û milîsên terorîst li Bakurê Sûriyê tune bikin.

24.04.2020an

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn

Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê